# HÊMANÊN MÎTOLOJÎK Û KESAYETÊN EFSANEYÎ

# DI DÎWANA MELAYÊ CIZÎRÎ DE

Sami Çeliktaş

## Destpêk

Di vê gotarê de em ê hewl bidin ku hêmanên mîtolojîk û kesayetên efsaneyî di Dîwana Melayê Cizîrî de dest nîşan bikin û bala xwe bidin ser erk û wateyên wan ên nav helbestan. Beşa yekan ji bo agahiyên derbarê dîwana Cizîrî, taybetiyên dîwanê û fikr û ramanên wî hatiye terxankirin. Agahiyên têkildarî dîroka çapkirin û şerhên dîwanê hatine parvekirin. Behsa paşxaneya fikrî ya ramanên Mela li gel çavkaniyên cihê hatiye kirin.

Li beşa duyem pênaseya mîtolojiyê bi kurtî hatiye dayîn û di pey re jî têkiliya mîtolojî û helbestê hatiye nirxandin. Beşa sêyem jî ji bo diyarkirina hêmanên mîtolojîk ên di dîwanê de hatiye veqetandin. Di vê beşê de qala têkiliya helbesta klasîk û mîtolojiyê hatiye kirin, şêweyên sûdwergirtina şairan a ji mîtan û erkên wan ên nav helbestan hatine nîşandan. Beşa sêyem a gotarê cih dide nimûneyên ji beytên dîwanê ku wek diyardeyên hêmanên mîtolojîk hatine şîrovekirin. Nimûneyên wergirtî, ku aîdî mîtolojiya Îranî û çanda Îslamê ne, li gor bûnewerên ku temsîla wan dikin hatine dabeşkirin.

Di gotarê de danasîna dîwana Cizîrî, danasîn û peywendîdarkirina mîtolojî û helbestê, lêkolîna li ser danûstandina mîtolojî û helbesta klasîk, tespîta nimûneyên nav dîwanê û analîz û şîroveya wan nimûneyên bi çarçoveya teorîk a gotarê hatine pêkanîn.

## 1. Melayê Cizîrî û Dîwana Wî

### 1.1. Dîwana Melayê Cizîrî

Peyva *dîwan* di termînolojiya edebiyata klasîk de ji bo berhemên ku hemû helbestên şairekî tê de hatine tomarkirin tê bikaranîn. Di dîwanan de ji bilî mesnewiyên serbixwe cureyên klasîk ên wek xezel, qesîde, murebba, terkîbî bend û hwd tên dîtin. Helbestên nav dîwanekê eger ku li gor serwa an jî paşserwayê ji tîpa elif ta y'yê bi awayekî elfabeyî bên

rêzkirin û cureyên tê de jî bi dorê wek qesîde, xezel û musemmet cih girtibin û piştre jî teşeyên biçûk hatibin ji wan re dîwanên tertîbkirî tê gotin (Adak, 2013: 404-405).

Di Dîwana Cizîrî de, ku yekem dîwana bitertîb a Kurdî ye, 114 helbest hene. Ji wan 21 qesîde ne û 87 jî xezel in. Her wiha 2 medhiye, 16 rûbaî, 1 tesdîsa Şêx Remezan, 1 terkîb bend, 4 terci' bend, 1 terdiye û 2 jî ferd tê de cih digirin (Adak, 2013: 196). Di nav çapên Dîwanê de çapa li Berlînê ya sala 1904'an ji hêla Martin Hartmann ve hatiye derxistin û ya M. Şefîq Arvasî sala 1919 li Stenbolê derxistiye yên herî girîng in. Gelek şerh û xebat jî li ser Dîwana Cizîrî hatine kirin. Ji wan yên berbiçav ew in: Şerha Mela Abdul Qadir ibn Hesen el-Cezîrî, şerha Mela Ebd ur-Rehmanê Westanî, şerha Hejar, xebatên kesên wek A. Durre, Izeddîn Mustefa Resûl, Arif Zêrevan, T. Î. Dosikî, Abdulbakî Turan, Abdul Mukit Sebtîoglu, Z. Kaya (Narozî, 2013).

Dîwana Cizîrî bi hemû xasyetên xwe yên şikl û naverokî, bi destxet, çapkirin, werger û şerhên hatî kirin dikare wek berhema sereke ya edebiyata klasîk a Kurdî bê pejirandin. Her wekî Tek jî destnîşan dike, Dîwana Mela hêj di dewra xwe de bûye metneke kanonîk, ji bo berhema Mela nezîre û texmîs hatine navîsîn, û şairên Kurd di bin siya wê de berhemên nû nivîsandine. Bi gotineke din, hebûna şerhên xurt ên Dîwana Cizîrî, wek metneke sazkar û bingehîn, yek ji palpiştên girîngiya wê metnê ye (Tek, 2019: 56-58)

### 1.2. Paşxaneya Fikrî ya Melayê Cizîrî

Ji bo têgihîştina bi Melayê Cizîrî divê çavkaniyên felsefeya Îslamê baş bên zanîn. Çavkaniya Cizîrî ya sereke Qur'ana pîroz e -her wekî alimên din ên îslamê ku ketine pey heqîqetê û li ser hêla batinî ya Quranê hûr bûne- wî jî bala xwe daye ser mijarên sereke yên wek hebûn û sifetên Xwedê, çêbûna cîhanê û pergala wê û mijarên din ên dînî. Qur'an çavkaniya herî girîng a felsefeya Îslamê ye. Ji bilî Qur'anê ekola felsefeya Îslamê ji gelek çavkaniyan sûd wergirtiye. Mirov dikare bibêje ku ev ekol bi kompozîsyoneke dewlemend a bîr û baweriyên wek Felsefeya Yewnana Antîk, Felsefeya Îranê, Felsefeya Hindê û baweriyên ji wir ên wek Brahmanî û Bûdayî, Çanda Ereb a Qedîm, Çanda Misrê, Baweriya Manîheîst û Zerdûştiyê kemiliye (Kutlu, 2019: 3).

Çavkaniyeke din a girîng ji bo Felsefeya Îslamê çanda Hindû-Arî ye. Hêmanên wê çandê bi rêya berhemên wek Zend Avesta û Veda û bi wergerên ji zimanê Pehlewî têkilî nav fikra Îslamî bûne û bandoreke mezin di pêşveçûna wê de nîşan dane. Felsefeya Îslamê di sedsala 9an de bi wergerên metnên felsefî yên qedîm geş dibe, bi pêşengên wek El-Kindî û

Farabî xîmê wê tê avêtin û bi danerê herî girîng Farabî bingeha xwe ya esasî digire. Di nav demê re bi tevkariya Îbnî Rûşd, û pê re jî bi Îbnî Arabî wek tesewifa felsefî pêşdeçûna xwe didomîne û bi Suhrewerdî jî çavkaniyên Farsî û Yewnanî di navenda Ramana Îslamî de digihîne hev (Kutlu: 3-4).

Tesewif baweriya herî girîng a wêjeya rojhilat a klasîk e û bi vî awayî jî xwedî tesîreke mezin e di şiîra Mela de. Melayê Cizîrî li şûna qiyas û eqlê, wek jêderka zanînê keşf û pêhisînê esas digire. Helbestên Mela ku tê de tecribeya tesewifî tê neqlkirin bi giştî bi rêya zimanekî sembolîk/metaforîk/alegorîk hatine îfadekirin (Doru, 2016: 17). Di dîwana Cizîrî de sembola neynikê, sembola avê, sembola herfê û sembola niqteyê yên herî binas in. Mela ew sembol ji bo ravekirina têkiliya Xwedê û alemê, afirandinê, û ji bo destnîşankirina wehdetê bi kar anîne (Doru, 2016: 19-22).

Dikare bê gotin ku helbestên Mela mişt bi hêmanên metafîzîk dagirtî ne û ew hêman jî serboriya sofîyê ku li heqîqetê digere rave dikin. Di vê babetê de nêrînên Hölderlin hêjayî qalkirinê ne ku serpêhatiya şair a metafîzîk bi têkiliya giyan û ziman rave dike: "Di merhaleya yekem de giyan piştî ku xwe di neyeksaniya fikirîn, hewldan û helbestîkirinê de dubare dike, piştî ku derdikeve derveyî xwe û di abadînê de ji nû ve bi xwe dihese, hîngê bi helwesteke saf û bênaverok, bi olana coş û pêhisîna bi koka xwe, bi bandora hemû ceribandinên navxweyî, bi vê pêhisîna esmanî ya bilind jiyana xwe ya hundirîn û derveyî dike yek û wek yekîtiyeke giyanî çi tişta ku ji qelb standibe şûnde didê" (Hölderlin, 2012: 103-104).

Hezkirina biazwerî û işq di hunera Cizîrî de xalên esasî ne. Mela paradîgmaya işqê bi çîrokên evîndariyê yên efsaneyî û bi vegotinên mîtolojîk di helbestên xwe de dineqişîne (Doru, 2016: 24). "Mutesewuf, bo pêdaçûn, razîkirin û xwegihandina Xweda 'işqê wek rêyekê ango weke amûrekê bi kar tîne" (Ertekin, 2017: 79). Hölderlin di proseya afirîneriya hunermend de erkek manendê işqê dide bedewiyê. Îdeya ku hemû nirxan dike yek, îdeya bedewiyê ye. Çalakiya aqil ya ku hemû îdeyan di xwe de kom dike çalakiyeke estetîk e û rastîbûn û başbûn wek du bira di bedewiyê de dibin yek (Hölderlin, 2012: 25-26).

Melayê Cizîrî qala hemû cure işqan kiriye û di helbestên xwe de cih daye wan (Ertekin, 2017: 80). Di mîtolojiya Yewnan û Romayî de işq xwedî pêşekiyeke girîng a hebûnê

ye. Eros (Amor) ê ku evîn bi xwe ye ji Ronahiyê dertê.[1] Di ramana tesewifî de jî işq armanca Xwedê ya avakirina cîhanê ye.

## 2. Mîtolojî û Helbest

### 2.1. Pênaseya Mîtolojiyê

Mîtolojî ji peyvên *myth* û *logia* pêk hatiye. Her çi peyva myth e, li gel gelek wateyên din, bêtir bi wateyên xwe yên wek *vegotin*ê, û *çîrok*ê tê zanîn. Logos jî tê wateya aqil û zanistê. Bi vî awayî, mîtolojî dikare wek zanista ku lêkolîna mîtan dike bê terîfkirin. Ji bilî vê, mîtolojî her wiha ji bo binavkirina koleksiyona mîtan jî tê bikaranîn. (Tökel, 2016: 4-6). Derbarê mîtolojiyê gelek pênase hatine dayîn. Ekola Binyadger, Ekola Psîkanalîst, Ekola Berawirdî û yên din li gor fikr û angaştên xwe yên esasî şîroveya mîtolojiyê kirine. Hin ji wan teoriyan bi rîtuelan, hinekan bi têkiliya hiş û binhişê mît û mîtolojî rave kirine. Hinekan fonksiyonên mîtolojiyê yên civakî û dînî, û hinekan jî formên çandî û zimanî derxistine pêş.

Lê dîsa jî ne têgeha mîtolojiyê ne jî mijara wê bi têrê zelal bûye, heta di encama her pênaseyê de pirseke nû derketiye holê. Pirsgirêka nezelabûnê ya derbarê mijar û sînorê xebatê, helbet ji bo gelek qadan derbasdar e lê ev tespît belkû ji hemûyan bêtir li mîtê tê. Her wekî Segal dest nîşan dike, teoriyên xweser ên mîtolojiyê jî hema bêje qet nînin, piranî wek hûrgiliyên ekolên felsefeyan û qadên zanistên wek mirovnasî, civaknasî û derûnasiyê hatine pêşkêşkirin. Jixwe mîtolojî bi serê xwe ne dîsîplînek serbixwe ye (Segal, 2004: 2).

Bingeha mitolojiyê li ser xîmê têgeha mîtê ava dibe. Bi nêrîna Segal tişta ku xebatên derbarê mîtolojiyê di çarçoveyekê de kom dike, pirsên ku li mîtê tên kirin e. Sê pirsên sereke hene ku vê çarçoveya navborî diyar dikin: Pirsek derbarê jêderka mîtê ye; pirsa duyem derbarê fonksîyona mîtê; û ya sêyem jî têkildarî mijara mîtê ye. Mebest bi jêderkê, derketina holê ya mîtê ye. Fonksîyon vê yekê dipirse bê ka mît çima û çawa hebûna xwe didomîne. Qesta bi mijara mîtê jî ew e bê ka hêmaya mîtê çi ye. Bo nimûne hin teorî bi awayekî edebî li ser mîtê dixebitin, hin teorî jî bi nêrîneke sembolîk mîtê dinirxînin (Segal, 2004: 2-3). Bayat jî di ravekirina xwe ya mîtolojiyê de pêşekiyê dide têgeha *mîtê,* û wê wek modeleke gelemperkirî ya pêhisîn, teşedayîn û sembolîzekirina jiyanê û bûyeran bi nav dike (Bayat, 2005: 3).

Di nav vegotinên pexşanî de efsane û çîrokên gel (çêrûng) jî hene ku bi awayekî bi mîtê re têkildar in. Efsane vegotinên pexşanî ne, ew jî her wekî mîtê ji hêla vebêj û guhdaran

---

[1] Li nexşeya destpêka pirtûka The Golden Age of Myth & Legend tê dîtin Eros di pileya sêyem a geneolojiyê de ye. Bnr. Thomas Bulfinch, The Golden Age of Myth & Legend, Wordsworth Editions, Hertfordshire, 1993.

wek bûyerên rast tên pejirandin, lê ew bûyer her wekî li heyameke nêziktir pêkhatibin tên qebûlkirin, heyamek wisa ku dinya kêm zêde wek îro bû. Lê berovajî mît û efsaneyan, çîrokên gel wek vegotinên pexşanî yên pevbestî (xeyalî) tên qebûlkirin (Csapo, 2005: 3).

Cudatî û cihêrengiya bîr û baweriyên derbarê mît û mîtolojiyê çiqas zêde bin jî, hemû ekol û şîroveyên mîtolojiyê vê rastiyê dikirpînin ku mîtolojî bi gelek avayan di nav çand, ziman û edebiyata gelan de binecî bûye. Her wekî Malinovski diyar dike hemû bîr û bawerî mîtolojiya xwe diafirînin û dîsa hemû qonaxên dîrokî mîtên xweserê xwe saz dikin (Malinovski, 1948: 64,122).

### 2.2. Têkiliya Mîtolojî û Helbestê

Mît destpêkê ji bo pênasedayîna bûyerên sirûştî, ji bo rêkûpêkkirina rîtuelan û ji bo binavkirina cih û waran wek mifteyeke pratîk bi kêr dihat. Di serdemên qedîm de mît vegotinên serbixwe bûn. Di nav demê re, çi bi kevneşopiya devkî çi jî bi awayê nivîskî têkilî nav cureyên din ên edebî bûn (Tökel, 2016: 14). Bi vî awayî jî di berhemên edebî de fîgurên mîtîk wek keresteyên berhemê an jî wek paşxaneya berhemê derketin pêş me (Tökel, 2016: 27).

Hêmanên mîtîk di helbesta klasîk de wek sembol, mecaz, mezmûn diyar dibin. Sembol diyarkirina têgehên razber a bi rêya ziman e. Tökel ji Eliade radigihîne ku dibêje sembol nirxeke nû li objeyekê dike bes xwe têkilî nirxên wan ên xweserê xwe û yên rasterast jî nabe (Tökel, 2016: 32). Derbarê derketina holê ya sembolîzma tesewifî de Ayvazoğlu nêrînên xwe wiha pêşkêş dike: "Mecaz şiklê kurt û xurtkirî yê teşbîhê ye û di hemû zimanan de peyde dibe. Mîtos û anthrophomorphism (teşemirovî) jî ji mecazê dertên. Helbestvanên mîstîk zanyariyên îlahê yên ku wisa bawer dikirin ku tenê ji wan re eyan bûye bi wan mecazan veşartine. Sembolîzma tesewifî wisa çêbûye" (Ayvazoğlu, 1993: 261). Mezmûn, an ku gotinên qalibgirtî yên ku têgehekê rave dikin an jî bi bîr dixin (Varışoğlu, 2004: 75) di nav wan de yên herî berbelav û tespîta wan hêsan in.

Di wêjeya klasîk de sembol, bi berawirdî hêmayê, xwedî qadeke berfireh a bikaranînê ye. Hêma bêtir tiştên şexsî ne, lê sembol derfeta bikaranînê ya bi awayekî giştî û hevpar dabîn dikin. Metaforên di edebiyata klasîk de cihêreng in. Gelek metafor hene ku anthtopomorphic in, an ku bi saya rûberîhevkirina ku ew pêk tînin tişta dermirovî dibe wek tişteke xwedî wesfên mirovî (Punter, 2007: 29). Bi rêya wan hemû têgehên edebî ku me bi kurtî qala wan kir nêrîteke helbesta klasîk derketiye holê ku ji bo tevahiya şairên demê sînoreke nivîsînê

kifşe kiriye. Jixwe ji bo şairekî vê serdemê, li gel behredariyê, beledbûna bi zanîn û çanda vê kevneşopiyê pêwîstiya herî zêde bû (Batıislam, 2002:186).

Tökel têkiliya mît û helbestê bi têgeha objektîvasyonê şîrove dike. Objektîvasyon derxistina derve, an ku afirandina tiştekî ye ku ji mêj ve nayê zanîn. Hunermend ji bo derbirîna hest û ramanên xwe di objeyan de guherînan pêk tînin û jê wateyeke nû didêrin. Vêca mît jî objeyên amade ne û bi wan metnek dikare bê sazkirin ku xwîner jê fêm bikin. Çîroka mîtîk bi serê xwe obje ye lê gava wateyeke nû lê bê barkirin hîngê dibe objektîvasyon. Lê mît xwedî taybetmendiyên wisa ne ku du caran tûşî objektîvasyonê dibin. Ew jixwe vegotina temsîlî ya tiştekê ne. Di pey re jî hunermend wan cara duyem bi qesta wateyeke dîtir diguherin (Tökel, 2016: 27).

Her ku di berhemên hunerî de mît wek sîmge û hêma xuya dibin, lewma jî ji bo têgihîştina berhemekê şîroveya wan sîmge û hêmayan pêwîst dibe. Mît hem bi şikleke aşkera û hem jî bi awayekî kûr û kompleks di nav tebeqên metnê de cih digirin. Fîgurên mîtîk carinan wek mezmûn û nîşander xuya dibin û bandorê li ser avahiya berhemê ya esasî dikin, carinan jî dibin çîroksaziya sereke ya metna edebî (Tökel, 2016: 38). Helbestvan hin caran ji bo kifşekirina zemînekî hevpar a bîra kolektîf, carinan jî ji bo derbirîna wateyên kûr bi kêmtir peyvan hêmanên mîtîk bi kar tînin di helbestan de (Tökel, 2016: 46).

### 3. Hêmanên Mîtolojîk Di Dîwana Melayê Cizîrî De

Dîwana Melayê Cizîrî mînakeke serkeftî ya helbestvaniya klasîk e, lewma divê di peywenda wê ya serdema navîn de bê nirxandin. Helbesta serdema klasîk ji hêla motîf, îmaj û sembolan ve dewlemend e û dîwana Mela jî wan dewlemendiyan radixîne pêş çav. Mela ji ber dijwariya derbirîna tecrubeya mîstîk serî li paradoks û sembolan daye, her ku sembol rêberên sofî ne di lêgerîna wî ya li heqîqetê de (Doru, 2016: 78).

Di dîwana Melayê Cizîrî de hebûnên asîmanê yên wek Roj, Stêrk, Birûsk; kesayetên mîtolojîk û efsaneyî; teyrên bi heybet ên wek Enqa/Sîmir, Hûma; kulîlkên wek Nergîz, Rihan, Sinbil; amûrên muzîkê yên wek Ney, Qanûn û Rebab; Ava heyatê, Mey û şerab; Afirîdeyên wek Dêw, Ifrît û hwd. dikarin bi mîtolojiyê re bên têkildarkirin. Ji ber ku ew unsûr tev, bi awayekî, bi çanda qedîm re têkildar in û mîtolojiyê jî wek zanista serdema seretayî bandor li ser werara wateya wan kiriye.

Di dîwana Cizîrî de fîgurên ji mîtolojiya Yewnan, Romayî, Hind û Çînê bêtir lehengên Şehnameyê, hêmanên aîdî mîtolojiya Îranî, baweriyên Ereban ên beriya Îslamê û qiseyên ku

di Qur'anê de derbas dibin tên dîtin (Yilmaz, 2012: 262). Qiseyên ku di Qur'anê de wek temsîl peyde dibin di nav demê re bi têkilhevbûna zanyariyên bi şêweyê Îsraîliyatê bûne mezmûn û ji hêla wêjevanên misilman bi gelek awayan di berheman de hatine bikaranîn (Yilmaz, 2012: 263). Dîsa jî xuya ye ku têkiliyeke kûrtir di navbera mîtolojiya rojhilat û rojava de heye. Hêmanên nav helbesta Rojhilat ku wek mezmûnên Îranî tên nasîn, bi awayekî têkildarî mînakên manend yên mîtolojiya Yewnan in. Têkiliya Cemşîd û Dîonîsos, ayînê Cem wek şahiyên Dîonîsos, sembola şer û mêraniyê Merîh li gel Ares, û Muşterî (Hurmus) jî wek Zeus dikarin wek mînak bên nîşandan (Kutlu:2019).

### 3.1. Hêmanên Asîmanî

Di dîwana Cizîrî de hêmanên esmanî û sirûştî yên wek Roj, Hîv, Stêrk, Birûsk û hwd. di gelek beytan de tên dîtin. Di kozmolojiya Îranî ya nerîta Zerduştiyê de her fenomeneke li ser rûyê erdê, çi razber û çi jî şênber, beramberî yeke esmanî ye, bi gotina Platon beramberî îdeayekê tê. Her tiştek, her nosyonek xwe bi du rûyan nîşan didin: rûyeke dîtbar ê asîman heye û rûyek jî nedîtbar. Dinya me dijberî asîman e, lê her pratîka li ser rûyê erdê xwedî beramberek li asîman e ku rastiya esasî temsîl dike (Eliade, 1959: 6).

Di nav hêmanên asîmanî de cihê Rojê yê di dîwana Cizîrî de ciheke bijarte ye. Di mîtolojiyê de jî roj ji hemû hêmanên din bihêztir xuya dike. Apollo (Hellios), yê ku di mîtolojiya Yewnan û Romayî de rojê temsîl dike, her tiştî dibîne û her tiştî dizane, an ku çavê Zeus e. Di mîtolojiya Hindî de çavê Varuna ye; di mîtolojiya Îranî de çavê Ahuramazda ye. Roj sembola rewneqî û bihêzbûnê ye. Her wisa roj temsîla leheng e jî ku li hember tora stêrkên din disekine. Roj di mîtolojiyê de li şûna hêza nêrbûnê digire û hîv jî wek nîşaneya mêbûnê wê timam dike. Ew wesf wisa xuya ye ku bi xasyeta Rojê ya tund û bitîrêj û bi nermbûn û kêmroniya hîvê re têkildar e (Cirlot, 1962: 317-318).

Max Müller, danerê teoriya Mîta Rojê (Solar Myth), serdemeke qedîm a bi navê mîtopoeîk dest nîşan dike. Di şêweya îfadeya wê serdemê de hemû hebûn dibûn wek şexs û hemû cure têkilî jî dibûn çalakî (Müller, 1856: 12-21). Dîsa wê demê her peyva Arî ya hevpar bi serê xwe mîtek bû. Ew peyv cismanî bûn û ji wan her yek têkildarî xasyeteke objeyekê bûn. Vêca bijartina wan xasyetan û îfadekirina wan a bi ziman wek helbesteke binhişî bû ku di roja îro de hatiye jibîrkirin (Müller, 1856: 68). Gotinên ku ji bo tevgera Rojê hatine bikaranîn, di nav demê re, di proseya pirwatebûnê de ji bo objeyên din jî hatine bikaranîn û ji wateya xwe ya eslî dûr ketine, û wateyeke mîtîk û sembolîk li wan hatiye barkirin (Müller, 1856: 104-109).

Roj di helbesta klasîk de herî zêde bi hikumdar re tê têkildarkirin. Hezkirî hikumdara dilê evîndar e, Roj jî hikumdarê felekê û stêrkan e. Hevşibandineke din jî ya Rojê û sûretê mirov e. Yar bi sûretê xwe yê mîna rojê can dide û bi sotîneriya xwe jî can distîne (Ay, 2009:158). Di malika jêr de Roj (Xurşîd) wek hêzeke wisa tê şayesandin ku veşartina wê û xwe veşartina ji wê ne mimkun e, û bi heman awayî dilber jî nabe bê veşartin. Di malika jêr de em mînaka teşbîha rojê bi sûretê dilberê dibînin.

Perdeya mehbûb di nêv qelban ku dê ker ker bikit

Qet di perdê xef dibin Xwirşîd û Mah û Zuhre ye (Dîwan, 191).

Roj bi wesfên xwe yên cihêreng, bi xuyabûnên xwe yên li gor danê sibê, nîvro an jî berêvarî di wateyên têkildarî vê rewşê di helbestan de derbas dibe.

Ji mihra wê şefeqsedê, şêrîn le'lê şeker-we'dê

Dinalim şubhetê re'dê ecîb im lê ji vê ce'dê (Dîwan, 23-24).

Heman şayesandina bi hêmanên esmanî di beyta li jêr de jî heye. Suheylê sema wek semboleke rewneqî û ronahiyê diyar dibe.

Hin gulê bo'enber in, hin di şîrîn esmer in

Hin guherî-dane yin mislê suheylê sema (Dîwan, 29).

Melayê Cizîrî di qasîdeya xwe ya derbarê Mîr de pesnê hikumdar bi rêya hêmanên asîmanî dide. "Mela ji bo berçavkirina hêz û desthilata Mîr ji objeyên asîmanî sûd werdigire û bilindiya Mîr bi alegoriya unsûrên asîmanî berçav dike" (Ergün, 2017:161).

Her kinarê pê ve wergêrî 'inanê himmetê

Zuhre bî peykê te û Kewan rikêbdarê te bî (Dîwan, 240).

Her wisa çerxa felekê, sefera bazneyî û dubareyî ku di helbestên Mela de hatine şayesandin têkildarî tesewira mîtolojîk in. Sêwirana gerdûnê ya wek bazneyî, ku di teoriya monomît a Joseph Campbell de xwedî ciheke esasî ye, di beyta jêr de derdikeve pêş me.

Ji mehbûb dûr kirim çerxê felek wê pir hilawêtim

Nizanim dê li kû dit min di vê dewran û çerxê da (Dîwan, 35).

Her wekî lehengê mîtolojîk ê Campbell di serpêhatiya xwe ya timamkirina sefera giyanê xwe ku bi veqetînê dest pê dike û bi hevgehînê diqede[2], serpêhatiya sofî ya ku bi ceribandinên dijwar û bi veqetîn û hevgehînan didome di malika jêr de tê dîtin.

Gelo dîsa bibînim ez çirayê wesletê hilbit

Bisojim şubhê perwanê di ber wê nûr û şewqê da

Di vê malika jêr de tevgera hevgirêdayî ya Rojê û stêrkan û rûberîhevkirina wê ya bi tevgera evîndar û evîna wê diyar dibe. Her wekî mînakên evîna gulberojkê ya ji bo Rojê ku her sibe bi avabûnê ta qulibînê bi awayekî heyirî temaşeya evîndarê xwe rojê dike ta ku Roj dema ku êdî jê bêzar dibe û bi tîrêjên xwe wê disoje; û wek mînaka evîna tesewifî ya murîdê bêhêz û armanca evîna wî ya wek Xweda yê ku çavkaniya hemû hêzan e.

Bi der bê kewkeba subhê li meşriq Zuhre tali' bit

Zuhel dûr bit bi şeş bircan û winda bit bi xerbê da (Dîwan, 35).

Di wan rêzikan de bayê sibê bi tevgera kerkirinê ku di heman demê de wesfeke mirovî ye derbas dibe.

Min dî seba bayê seher, madarê bedrê kir du ker

Qews û qezeh jê hate der dîsa bi zulfan re teba (Dîwan, 23-24).

Di vê malika jêr de bi gotinên wek *quba gerdûnê*, bi peyva *xan* û peyva *dewran* serboriya mirov a vê cîhanê hatiye şayesandin. Kirpandina li ser demborîbûna wê serboriyê di helbestê de aşkera ye û ew jî dişibe serpêhatiya mirov a mîtîk ku di sefera leheng a bazneyî de serpêhatî li bin quba cîhanê timî berdewam e bes ji bo her takekesî jî bi şikleke demborî ye jî.

Di vê taqê di vê xanê me 'eyş û êminî kanê

Kesê dest dit ji dewranê, nîhalik vê gulistanê (Dîwan, 23-24).

### 3.1.1. Statîstîka Hêmanên Asîmanî

| | |
|---|---|
| **Afitab** | 10 |
| **Birûsk/Berq** | 4/32 |
| **Çerx** | 54 |

[2] Bnr. Joseph Campbell, The Hero With A Thousand Faces, Princeton University Press, 1968.

| | |
|---|---|
| **Dewran** | 4 |
| **Mah/Qemer** | 20/8 |
| **Mahitab** | 6 |
| **Merîx** | 4 |
| **Muşterî** | 14 |
| **Kêwan** | 1 |
| **Kewkeb** | 23 |
| **Roj** | 37 |
| **Suheyl** | 1 |
| **Stêr** | 4 |
| **Şefeq** | 18 |
| **Şems** | 19 |
| **Xerçeng** | 2 |
| **Xurşîd** | 6 |
| **Zuhel** | 5 |
| **Zuhre** | 24 |
| **BI TEVAHÎ** | **296** |

### 3.2. Kesayetên Efsaneyî

Di dîwana Cizîrî de leheng û keysarên mîtolojiya rojhilat, piranî jî fîgûrên gelên Îranî ên di Şehnameyan derbas dibin, tên dîtin, wek nimûne Rustem, Îskender, Efrasiyab, Xusrew, Cengîz û hwd. Navê pêxemberan û cih û bûyerên têkildarî wan di helbestan de xuya dibin. "Di dîwana Cizîrî de navên eshabeyên ku bi cesaret û lehengiyên xwe tên nasîn wek Elî, Xalid, Hemze; û kesayetên mîtolojîk û dîrokî yên wek Belkis, Xizir û hwd jî derbas dibin" (Bilgin, 2017: 11).

Di vê malika jêr de Îskender bi ayîne û Cemşîd bi camê tên qalkirin:

Yek girtiye zulfê we yekî xalê numayî

Ayîne bi Îskenderî û camê bi Cem da (Dîwan, 25).

Bi Ayîneya Îskender qesta wê neynika qerase hatiye kirin ku Îskender li bajarê Îskenderiyeyê bi destê hekîmên navdar Belinas, Hermis û Valines daye çêkirin û tê de wêneyên ji derya û bejahiyên dûr tên dîtin (Tökel, 2016:159). Di helbesta klasîk de navê Cemşîd têkildarî hêz û desthilatiya xwe, bi peydekirina şerabê, bi qedeha xwe ya ku di ser de heft xet hene, civatên xwe yên ayîngeriyê û bi text û tacê xwe tê qalkirin. Pirî caran helbestvan wî bi hikumdar an jî yarê berawird dikin, çi bi şiklekî erênî çi jî neyînî. Helbet qedeh û şeraba ku tê behskirin xwedî wateyên sembolîk ên zewq û hezkirina tesewifî ne (Tökel, 2016:104-106).

Dîsa li malika jêr Cemşîd û Key Xwisrew bi mebesta berawirdkirinê derbas dibin:

Çi hedê sed hezar can bin di fitraka hebîbê min

Ku sed Cemşîd û Key Xwisrew xulam in bi ser devê rê da (Dîwan, 36).

Li malikên jêr behsa hikumdarên mît û dîrokî yên bi qudret wek Eskender, Xusro, Şapûr bi mebesta pirolekirina hêza mîrê serdemê hatine kirin:

Ma Cizîrê Şubhê darê textê heft iqlîmi bit

Hem bi hukm û seltenet Eskender û Fexfûrî bit

Çendekî şîrînpuser derbendê dîwana te bin

Bendê şapûrê te bin ta Xusro û Şapûrî bî (Turan, 2010: 224-225).

Di malika jêr de Cizîrî Rustemê ku temsîla hêzê ye û Ferhadê temsîla kêrhatin, fedakarî û xebatê ye ji bo terîfa rewşa bêxwedîbûn û bêkesbûnê bi kar tîne. Hêza Rustem û kêrhatîbûn û fedakariya Ferhad bi rewşeke tezat ve wek hêza bêhêz û kêrhatîbûna nekêrhatî nîşan kiriye.

Bi şirînê negihit dest-i eger Rostemî bit

Dê bi baz û milan şubhetê Ferhadê çi kit (Dîwan, 62).

Di dîwana Mela de ji bilî kesayetên efsaneyî, em rastî pêxemberan, kesayetên dînî û dîrokî jî tên. Xasyetên wan kesayetan ên berbiçav û naskirî ji hêla Mela ve di çarçoveya hunerên ciwankariyê de hatine şixulandin. Di dîwana Mela de kompozîsyoneke berfireh a kesayetên efsaneyî û dîrokî bi temsîleke berfireh û bi şixulandina her yekê bi hunera gotinê cih digire

Di malika jêr de Belqîz wek kesayeteke têkel a dîrokî û efsaneyî bi bedewiya xwe dibe amrazeke teşbîhê ya şiîra Mela.

Min dilberek wek dur heye mehbûbê şîrînsur heye

Husn û cemalek pur heye Belqîs-sifet mesken Seba (Dîwan, 31).

Di malika jêr de jî kesayetên Rustem û Cemşîd li gel kesayetên dîrokî û dînî yên Xalid, Hemze û Şêrê Elî bi rêya hunera bibîrxistinê di heman peywendê de derdikevin pêş me. Ew kesayet her çiqas di demên cuda de jiyabin jî, bikaranîna wan a bi vî awayî sêwiran û îmajeke hevpar di hişê xwîner de çêdike.

Rostem û Cemşîd û Xalid Hemze yan Şêrê Elî

Aferîn ya şehsiwarê tirk û rimbazê ereb (Dîwan, 45)

Cengîzxanê Tirk ê *cengengîz* jî wek kesayetekî dîrokî bûye navgîneke vegotinê di şiîra Mela de.

Ji re'na nêrgizên tey mest û xwînrîz

Zeman bû 'ehdê cengengîzê Cengîz (Dîwan, 112).

Di malikên jêr ên têvel de em rastî pêxember hz. Nuh, Îsa û Mûsa tên:

Tali' ku têt û furset muhlet li nik heram e

Min 'umrê Nûhî nîne wer saqiyo bi lez xweş (Dîwan, 120).

Min can yedê beyda ye ji 'Îsa çi xeber dim

Min ateşê Mûsa diye gulnarê şerabê (Dîwan, 237).

Dîsa di malikên jêr ên şiîrên cuda de bi tema û hunerên vegotinê yên cihêreng em tûşî kesayetên girîng ên edebiyata klasîk û baweriya tesewifî dibin wek Se'dî, Camî, Hafiz Şîrazî û Mensûr û yên din.

Me ra j' ewwel çi bir xamî kişand axir bi bednamî

Ji rengê Se'dî û Camî ji şuhret pê hisîn 'amî (Dîwan, 24).

Hostayê 'işqê dil hevot ser ta qedem hingî disot

Remza "ena'l-Heq" her digot bawer bikin Mensûr e dil (Dîwan, 158).

### 3.2.1. Statîstîka Kesayetên Efsaneyî

| | |
|---|---|
| **Belqis** | 2 |
| **Camî** | 1 |
| **Cemşîd** | 2 |
| **Cengîz** | 1 |
| **Efrasiyab** | 1 |
| **Elî** | 3 |
| **Ferruhî** | 2 |
| **Ferhad** | 6 |
| **Hafiz Şîrazî** | 1 |
| **Hemze** | 1 |
| **Îskender** | 5 |
| **Îsa** | 5 |
| **Key Xwisrew** | 4 |
| **Mensûr** | 1 |
| **Mûsa** | 5 |
| **Nuh** | 2 |
| **Rustem** | 3 |
| **Se'dî** | 1 |
| **Suleyman** | 4 |
| **Şiblî** | 1 |
| **Teymûrileng** | 1 |
| **Xalid** | 1 |
| **Xizir** | 7 |
| **Yûsif** | 5 |
| **BI TEVAHÎ** | **65** |

### 3.3. Teyrên Mîtolojîk

Di helbestên klasîk de teyrên mîtolojîk ên wek Hûma, Zimrudê Enqa, Hudhud wek sembol û bi hin fonksiyonên derbirînî cih digirin. Hûma bi zimanê Farisî tê wateyên wek teyrê dewletê, teyrê bext û teyrê desthilatiyê. Siya wê bikeve ser mirovekî ev yek bi nîşaneya zengîniyê tê şîrovekirin. Hûma bilind difire û hêlîna wê jî li asîman e, li gor rîwayetan hestiyan dixwe. Vêca ji ber bilindfirînê, siya wê ya bixêr û bihêzbûna ji balindeyên din ew di helbesta klasîk de bi şibandin û sêwirandina xurtiyê cih digire. Siya Hûmayê bi zulfa yarê re tê têkildarkirin ku gihîştina wê tişteke ne hêsan e. Carinan sembola evîndara ku bidestxistina wê dijwar û carinan wek sultanê xwedî qudret xuya dibe (Batıislam, 2002: 193).

Her dilê bazîsifet dê seydî teyxûnek we bî

Firr û perwazê humayî penceyê şunqar-i bit (Dîwan, 55).

Teyrê Enqa bi zimanê Îbranî ji peyva *anak* tê û xwedî wateyên wek gerdenî, bejndirêj û dêw e. Padişahê teyran e. Teyrê Enqa û Sîmir di piraniya çavkaniyan de li şûna hev tên bikaranîn. Di riwayetan de sûretê wê wek ê mirovan tê terîfkirin û di bedena wê de elametên sih teyran heye, xuya ye ku ew nav ji ber vê yekê tê. Di mîtolojiya Îranî de Enqa/Sîmir, Zal mezin dike û ji Rustem re dibe alîkar. Di mîtolojiya Îslamê de padişahê teyran e, li serdema Hz. Mûsa çêbûye, li meclîsa Hz. Suleyman de amade bûye, li Çiyayê Qafê bi Hz. Zulqarneyn re hevdîtin çêkiriye û beriya serdema Hz. Muhamed bi nifrîna pêxemberekî ji holê rabûye (Batıislam, 2002: 195-204).

Sîmir wisa tê bawerkirin ku wek mirovan difikire û aqilmendiya padişah û lehengan dike. Bi baskên xwe birînan qenc dike. Di baweriya Xirîstiyaniyê de piştî ku dimire xwe ji xweliya xwe vedijîne. Di mîtolojiya Çîniyan de ew mûcîdê reqs û muzîkê ye. Di edebiyata klasîk de bi wargehê xwe yê bi navê Çiyayê Qaf, bi baskên xwe yên kesk hatiye şayesandin, û bi bilindfirîn û bêmekanbûnê jî bi yara dûredest û gehîna wê nepêkan re hatiye têkildarkirin. Di edebiyata tesewifê de wek teyrê tunekirin û qurtkirinê hatiye şayesandin.(Batıislam, 2002: 195-204).

Di helbesta Qelbê Me Şubih Zêrî de qala Enqayê tê kirin.

Enqa ne şîgara kes e davan tu biçin ver

Dava ku li Enqa tu vedî badihewa girt (Dîwan, 58).

Û helbesta Mehbûb-i Bi Dil Bit de dîsa heman teyr derbas dibe.

Mehbûb-i bi dil bit me bi evrazî çi hacet

'Enqa bi xwe bêtin firr û perwazî çi hacet (Dîwan, 60).

Hudhud di vê beyta jêr de wek çivîkek peyamnêr hatiye şayesandin. Di teoriya mîtolojiyê ya Campbell peyamnêr ew afirîdeya ku agahiyê dide leheng e; û dîsa peyamnêr wek arketîpek mîtolojîk hem di teoriya Cambell de û hem jî di sîstema Jung a li ser arketîpan ava bûye cih digire û xwedî fonksiyoneke girîng e.

We ye hudhud ji Seba bêt û bizanin çi ye hal

Ku li halê me xerîban ne sûal û ne cewab (Dîwan, 42).

### 3.3.1. Statîstîka Teyrên Mîtolojîk

| | |
|---|---|
| **Baz** | 8 |
| **Enqa** | 3 |
| **Hudhud** | 7 |
| **Huma** | 8 |
| **Şahîn** | 5 |
| **Şehbaz** | 5 |
| **Tawus** | 1 |
| **Teyxûn** | 2 |
| **Qumrî** | 4 |
| **Uqab** | 4 |
| **BI TEVAHÎ** | **47** |

### 3.4. Hêmanên Têvel ên Mîtolojîk

Muzîk û unsûrên têkildarî wê xwedî qîmetên mîtolojîk in. Helbestên Homeros bi bangkirina li xwedawenda îlhamê *Muse* re dest pê dikin (Joubert, 1993: 41). Muzîk û amûrên muzîkê di mîtolojiya Yewnana Qedîm de di şexsê fîgurên wek Apollon, Pan, Orfeus de xwedî temsîlên naskirî ye. Muzîk ji hêla sêwirîna kozmîk ve jî bi rojê û stêrkan re têkildar e, an ku sîstema muzîkê wek gelek tiştên din bi şibandina sîstema asîmanî hatiye peywendîdarkirin."Di wêjeya tesewufê de 12 meqamê muzîkê, beramber bi 12 bircan û 24 saetên rojê tên ramandin. Ji boy vî, divê stranên evînê li gorî her birc û saetekê bi meqamên diyarkirî bên xwendin" (Mamoste Qedrî, 2004: 123).

Di vê malika jêr de muzîk, li gel amûrên ney û sazê, wek hêmaneke biraz hatiye qalkirin ku têkildarî giringiya têgeha semayê û girîngiya bihîstinê ya di tesewifê de ye.

Ji Hafiz Qutbê Şîrazê Mela fehm er bikî razê

Bi awazê ney û sazê, bibî ber çerxê perwazê (Dîwan, 23-24)

Ney amûreke sembolîk e û zêdetir wek sembola mewlewiyê tê pejirandin. Ji ber ku hundirê wê vala ye, tê wateya veqetîna ji masîvayê û sofî û evîndarên durist ên ku hundirên wan bi nefesa heq tijî bûye sembolîze dike (Yavuz, 2010: 174).

Lew di çengê me dixûnî, ku di eşqa te bi saz

Me bi bejna te dixûnin, ney û qanûn û rebab (Dîwan, 41).

Di helbesta klasîk (helbesta dîwanê) de beriya sedsala 18an gewde ne wek organên bi hev ve girêdayî, wek perçeyên ji hev cuda dihat teswîrkirin. Wicûd bi wateyeke anatomîk nedihat şayesandin, berovajî vê xwedî wateyeke tesewifî û têkildarê hebûnê bû. Vêca gewde ji bo temsîla çi bihata ferzkirin bi vê ve dihat têkildarkirin. Di helbesta dîwanê de gewde tişteke bêlebat bû (Yavuz, 2010:186-187).

Cerg û cesed têk sohtine lew xef xedengan nuhtine

Ji qewsê hilalî jih tune heyranê dêma mehweşîn (Dîwan, 178).

Kulîlk di mîtolojiyê de li gor şikl û esasên xwe xwedî wateyên cihê ne. Piranî bi demsala biharê re tên têkildarkirin û bi vî awayî jî nîşaneya bedewî û ciwaniyê ne. Di mîtolojiya Romayî de bi rojê tê têkildarkirin û lewma jî wek metafora Navendbûnê tên sêwirandin (Cirlot, 1962:110). Ji wan ya herî navdar Nergîz e ku di mîtolojiya Yewnan de bi çîroka Narkisus tê zanîn û zêdetir bi mestbûnê, bi hezkirin û heyirîna ji xwe dibe mijara helbestan.

Nergîza mestî ji bala çîmena sunbul û gul tê

Qedehê taze bi destê xwe meşî da me lebaleb (Yoyler, 2006: 106).

Selwî jî wek nergîzê di helbesta Mela de gelek caran derdikeve pêş me. Di mîtolojiya Yewnana Antîk de qala selwiyê bi çîroka mîtolojîk a Apollon û Cupressus tê kirin. Cupressus, ku bi zimanê Yewnanî beramberî selwiyê ye, tîrbazekî jîr e. Ji aliyê Apollon ve tê xapandin û bi derba tîrê xwe dibe bayîsê kuştina xezalekê, û ji ber wê kiryara xwe pir xemgîn dibe. Apollon jî di encamê de poşman dibe û wî diguherîne dara xemgîniyê. Di malika jêr de selwa bi peywenda xemgîniyê û bi awayekî jî dikare bi çîroka jor re bê têkildarkirin.

Xwîn ji dil co co rewan tê wek 'eqîq û erxewan tê

Lê ji dest selwa ciwan tê ew şepala şeng û şox (Dîwan, 90).

Riwekên wek Rihan, Nesrîn, Binefş, Sosin û riwekên din bi wateyên têkildarî şikl û xasyetên hebûna xwe di helbestan de diyar dibin.

Kagulê berde bi ser xal û xetan

Ku muselsel binumêt rihan î (Dîwan, 267).

Kêşeyeke sereke ya lehengê mîtolojîk qenckirina hin êş û eleman û lêgerîna nemirinê ye. Di mîtolojiyê de leheng, berovajî yezdanan, fanî ye û hewldana wî ya bingehîn peydekirina çareya vê yekê ye. Ev lêgerîn bi rêya hêmanên wek ava heyatê, bi kaniya ciwaniyê an jî riweka nemirbûnê û bi iksîrên ku dermanên elemên cihê ne sembolîze dibe, ku temsîla herî navdar lêgerîna Gilgamêşê Sumerî ye. Unsûrên bi vî rengî wek mezmûn di helbestên klasîk de tên dîtin. Li jêr Mela qala *Iksîra* xemê dike:

Minnet ji Xudayê ku bi 'ebdê xwo Melayî

Iksîrê xemê 'işqê, ne dînar û dîrem da (Turan, 2010: 206).

Di vê malika jêr de jî Mela gotinê tîne ser ava heyatê. Tê dîtin ku ava heyatê wek armaceke lêgerînê hatiye destnîşankirin û di peywenda şixulandina vê hêmanê de bi sêwiraneke kûr cih daye rewşa Xizir jî.

Ez giham ava heyatê xef ji dil

Xudr-i vajî çûye heywanê xelet (Dîwan,132).

Afirîdeyên dersirûştî yên wek Erjeng, Ehremen û dêw û ifrîd ku di temsîla xirabî, tarîtî û binhişê û azweriyên mirovan ên xirab dikin di helbestên Cizîrî de diyar dibin. Reng e ku di vê malika jêr de bi revandina gustîla Suleyman a ji hêla Ehreman, Mela rewşa bêdad a serdema xwe bi serdestbûna xirabiyê şîrove kiriye û ji bo vê yekê jî serî bi mîta serdestiya hêzên xirab daye.

Day û key min lê hezar in gul di dest şewkên bi xar in

Surperî dêw wê l'kinar in Ehremen xatem revaye (Dîwan,197).

### 3.4.1. Statîstîka Hêmanên Têvel ên Mîtolojîk

| | |
|---|---|
| **Çeng** | 31 |
| **Def** | 7 |
| **Ney** | 17 |
| **Qanûn** | 8 |
| **Rebab** | 5 |
| **Rûd** | 1 |
| **Şebab** | 2 |
| **Ûd** | 3 |
| **Zengil** | 1 |
| **Binevş** | 4 |
| **Gul** | 25 |

| | |
|---|---|
| **Nergîz** | 30 |
| **Nesrîn** | 6 |
| **Çiçek** | 9 |
| **Rihan** | 8 |
| **Selwa/Serwî** | 14/8 |
| **Sunbul** | 23 |
| **Abi Heyat/Heywan** | 19 |
| **Iksîr** | 7 |
| **Dêw** | 2 |
| **Ifrîd** | 4 |
| **Ejderha** | 3 |
| **Ehremen** | 2 |
| **Erjeng** | 1 |
| **Newroz** | 1 |
| **BI TEVAHÎ** | **241** |

**Encam**

Di edebiyata klasîk de mîtolojî bi sêwirana gerdûnî ya xweserê xwe, bi çîrokên mîtîk, bi lehengên mîtolojîk û sembolên têkildarî hêz û şiyanên wan, û bi kesayetên dîrokî ku di nav demê re bûnê takekesên mîtolojîk, bi afirîde û riwekên ku bi rêya mantiqê mîtê bûne xwedî şexs derdikeve pêş me. Cizîrî, her wekî şairên beriya xwe û yên hemçaxê xwe, di çarçoveya form, naverok û helwesta şairî ya nerîta edebiyata Îslamî ya tesewifî de ji çanda rojhilat sûd wergirtiye û unsûrên çandî li gor bîr baweriya xwe ya tesewifî di helbesta xwe de bi kar aniye. Di hunera Cizîrî de nirx, fonksiyon û cihdayîna wan hemû unsûran li gor cihê wan ên nav hîyerarşiya afirînê hatine diyarkirin.

Di nav hêmanên asîmanî de Mela pêşekî daye Rojê, ew li navendê resm kiriye û bi gelek peyvên hemwate ew şayesandiye. Wî Roj wek hêza asîmanî ya li ser hemû tiştan û çavkaniya hemû hebûnan ji bo terîfa fîgurên sererdê yê mîr, sultan û yarê bi kar aniye û bi wesfên rojê hin mecaz, şibandin û tezat di şexsê wan û hezkirina bi wan de derxistiye pêş çav. Di nav hêmanên asîmanî de, dema em statîstîka wan li ber çav digirin, Roj li gel peyvên heman wateyê yên wek Afitab, Şems û Xurşîd bi tevahî 72 caran derbas dibe û bi vî awayî jî tê dîtin ku hêmana asîmanî ya ku Cizîrî herî zêde bi kar aniye Roj e. Li pey Rojê jî hejmara bikaranîna zêde ya stêrkên wek Muşterî, Şefeq, Kewkeb û Zuhre balê dikişînin. Ew her çar stêrk bi tevahî 79 caran di dîwanê de cih digirin. Ew dane sêwirana Mela ya wek *'di navendê*

*de roj û li dorhêlê jî stêrk'* dupat dike û nîşan dide ku wî Dîwana xwe bi vê sêwiranê awa kiriye. Mah, Mahitab û Qemer jî bi tevahî 34 caran derbas dibin. Di Dîwanê de peyvên Çerx û Dewran 58 caran derbas dibin. Reng e ku Mela sêwirana xwe ya kozmîk li wateyên wan peyvan bar kiriye. Her wisa Birûsk û Berq jî 36 caran derbas dibin û wek rengderên nîşaneya agirê evînê û dijwariya işqê ji hêla Mela ve hatine şixulandin.

Cizîrî kesayetên mît û dîrokî bi rêya telmîhê û bi şêweyên berawirdî ji bo rûberîhevkirina rojane ya muxatabê xwe şixulandiye. Bi mebesta pirolekirina hezkirina yarê an jî qudreta mîr û hikumdarê xwe, hêz û qudreta wan leheng û hikumdarên mîtîk ji bo berawirdkirinê derpêş kiriye, carinan jî bi rêya telmîhê rewşa xwe ya dijwar pê wan aniye ziman. Di Dîwanê de temsîleke berfireh a leheng û kesayetên ji mîtolojiya Îranî û mîtolojiya Îslamî heye. Piraniya wan kesayetan yek an du caran di dîwanê de derbas dibin. Lê lehengên mîtolojiya Îranî yên wek Ferhad (6 car), Îskender (5 car), Key Xwisrew (4 car), Rustem (3 car), zêdetir xuya dibin. Di nav kesayetên dînî de Yûsif (5 car), Mûsa (5 car), Îsa (5 car), Suleyman (4 car) û Elî (3 car) derdikevin pêş. Xizir wek fîgureke dînî û folklorîk 7 caran di Dîwana de derbas dibe. Tê dîtin ku frekansa bikaranîna kesayetan, her çiqas lîsteyeke berfireh be jî, li gor hêmanên asîmanî pir hindik e.

Teyrên mîtolojîk ên wek Enqa, Huma, Hudhud bi wesfên xwe yên di mîtolojiyê de nasrav, û gelek hêmanên din ên ku di edebiyata klasîk de wek mezmûn bûne referansên şairan li gor xasyetên xwe di dîwana Cizîrî de bi erkên hunerî tên dîtin. Huma (8 car), Hudhud (7 car), Enqa jî (3 caran) di Dîwanê de derbas dibin. Teyrê Baz, bi navên wek Şahîn (5 car) û Teyxûn (2 car) bi tevahî 15 caran derbas dibe. Di nav amûrên muzîkê de yên herî zêde hatine bikaranîn Çeng (31 car), Ney (17) û Qanûn in, her ku tê zanîn ew her sê amûr di berhemên klasîk ên rojhilat de sembolên girîng in. Di nav riwekan de yên ku herî zêde derbas dibin Nergîz (30 car), Gul (25 car), û Selwî (22 car) ne. Xuya ye ku Mela xwestiye ji temsîlên wan ên xurt sûd wergire. Ew her sê riwek hem di mîtolojiya Rojhilat de û hem jî di ya Rojava de xwedî paşxaneyên dewlemend ên mîtolojîk in. Afirîdeyên mîtolojîk ên ku bi xasyetên qenc û neqenc bûne mezmûnên klasîk, li gor hêmanên din bi rejeyeke kêm di Dîwanê de cih girtine: Ifrîd (4 car), Dêw (2 car), Ejderha (3 car), Ehremen (2 car) û Erjeng (1 car) derbas dibin. Di nav lîsteya hêmanên têvel de ava heyatê (19 car) balê dikişîne, her ku wateyeke dêrîn û mîtolojîk pê ve girêdayî ye. Dîsa balkêş e ku peyva Newrozê bi tenê yek carê di Dîwanê de derbas dibe.

Di encamê de dikare bê gotin ku Cizîrî her çiqas wek kevneşopiyeke helbesta klasîk hêmanên mîtolojîk di hunera xwe de bi kar anîbe jî, ew bi şêweyê bikaranîna wan, bi behredariya di têkildarkirina hemû wan hêmanan de û bi têkalaviya ji wan afirandî xwedî ciheke bijarte ye. Cizîrî bi awayekî serkeftî dewlemendiya mîtolojiyê xistiye bin xizmeta şiîra xwe. Hêman û kesayetên mîtolojîk ên aîdî dewrên qedîm paşxaneya şiîra wî xurt kiriye û dawiyê jî kompozîsyoneke zengîn a hunerî derketiye holê.

**ÇAVKANÎ**


Adak, Abdurrahman, (2013), *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk,* Weşanên Nûbiharê, Stembol.

Ay, Ümran, (2009), "Divan Şiirinde Güneşin Sevgili Tipine Yansıması Hakkında Bir Değerlendirme", *Divan Edebıyatı Araştırmaları Dergisi 2,* İstanbul.

Ayvazoğlu, Beşir, (1993), *Aşk Estetiği*, Ötüken Neşriyat, İstanbul.

Batıislam, (2002), "Divan Şiirinin Mitolojik Kuşları: Hüma, Enqa ve Simurg",*Türk Kültürü İncelemeleri Dergisi 1*, İstanbul.

Bayat, Fuzuli, *Mitolojiye Giriş*, KaraM Yayınları, Çorum.

Bilgin, Abdulcelil, (2017), "Kur'ana Divan Durmak: Vahyin Renk ve Tonlarının Cizîrî'nin Şiirindeki Nicel Yansımalarına Dair Bir İnceleme", di nav *Mukaddime* - Melayê Cizîrî Özel Sayısı, ed.: Doru, Nesim.

Csapo, Eric**,** (2005), *Theories of Mythology,* Blackwell Publishing, Oxford.

Doru, M. Nesim, (2016), *Melayê Cizîrî, Hakikat ve Mecaz Arasında Bir Sûfi'nin Portresi,* Weşanên Nûbihar, Stembol.

Eliade, Mircea, (1959), *Cosmos and History,* Harper Torchbooks, New York.

Ertekin, M. Zahir, (2017), "Agirê 'Işqê Di Perspektîfa Mela de", di nav *Mukaddime* - Melayê Cizîrî Özel Sayısı, ed.: Doru, Nesim.

Hölderlin, Friedrich, (2012), *Şiir ve Tragedya Kuramı,* Notos Kitap, Çev: Mehmet Barış Albayrak, İstanbul.

*Gerdeniya Gewherî, Şerha Dîwana Melayê Cizîrî*, (2013), Amd. û Wer. Emîn Narozî, Avesta, Stembol.

Joubert, J-L., (1993), *Şiir Nedir,* Öteki Yayınları, Çev: Ece Korkut, Ankara.

Kutlu. İlteriş, "Klasik Türk Edebiyatı Araştırmalarında Antik Yunan Kaynaklarının Önemine Dair***", https://www.academia.edu*** (02.01.2019).

Malinovski, Bronislav, (1948), *Magic, Science and Religion and Other Essays,* The Free Press, Illinois.

Mamoste Qedrî ,( 2004), "Werger û Şîroveya Dîwana Melayê Cizîrî", *Kovara WAR,* Hejmar:15, Bihar.

Melayê Cizîrî, (2012), *Dîwan,* (Amd. Emîn Narozî), Weşanên Avesta, Stembol.

Müller, Max, (1856), *Comparative Mythology,* Routledge Publications, London.

Narozî, Emîn, (2012), *Dîwana Melayê Cizîrî,* Weşanên Avesta, Stembol.

Punter, David, (2007), *Metaphor,* Routledge, London and New York.

Segal, Robert A., (2004), *Myth A Very Short Introduction,* Oxford University Press, New York.

Tek, Ayhan, (2019), *Melayê Cizîrî Jiyan Û Tesîra Edebî Şerha Xezelên Bijartî,* Weşanên Nûbiharê, Stembol.

Tökel, Dursun Ali, (2016), *Divan Şiirinde Şahıslar Mitolojisi,* Fatih Sultan Mehmet Üniversitesi Yayınları, İstanbul.

Turan, Abdulbaki, (2010), *Melayê Cizîrî Divanı ve Şerhi,* Weşanên Nûbiharê, Stembol.

Varışoğlu, Mehmet Celal, (2004) *18. Yüzyıl Divan Şiirnde İstiare, Mecaz ve Mazmun Kavramları ve Yüzyılın Şiirine Genel Bakış,* Ezurum Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Doktora Tezi, Erzurum.

Yavuz, Hilmi, (2010), *Okuma Biçimleri,* Timaş Yayınları, İstanbul.

Yilmaz, Mehmet, (2012), "Mela Ahmedê Cizîrî'nin Kültür Dünyası", Di nav *The Journal of Academic Social Sciences* de, Volume 5 Issue 1.

Yöyler Celalettin, (2006), *Şîroveya Dîwana Melayê Cizîrî,* Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol.